berdewam bike, çiku ev sisteme kevin li Rojhilata Navîn gelek nexweşî di hundirê xwe de hilanîn di encama zulm û setema ku li hemû pêkhateyên herêmê bû de, hevdijayeti û nebawerî di navbera wan de afirand û ziyanike pir mezin gihand hevjiyana aştiyane, roj bi roj birîn kul dibû û di vê jîngehê de ramanên bergîr û teror geş dibûn heyâ giha astekê bû gefek li ser berjewendi-yên dewletên serwer di cihanê de û bi taybet Emerîka lewre piştî êrişên 11ê Elûnê yekser siyaset-medarên Emerîkî û pilangerên wê yên stratiçik berê xwe dan herêmê ta ku pirojeya Rojhilata Navîn ya nû cîbicî bikin û ji Iraqê destpê kirin. Bi ruxandina réjîma Sedam birîna kul teqîya û hemû qirêj û elema salan ya di bin cilkê de veşartî bû dest bi derketinê kir û bi şeweyleke tund derket holê, piştî 13ê salan ji tundutujiyê li Iraqê girêdana di navbera pêkhateyên wê de sist û alozti bûne û egeriya hevjiyandina wan ligel hev di hundirê yek dewletê

de kêmter büye, ev tiş tev de di
bin çavdêriya Emerika de dibe ku
navê tevliheviya afrîner lê hate
kirin.

Heman dîmen li Sûrî rûda lê cu-
dahî di navbera herdu dîmenan
de ku Emerika ruxandina rîjîmê
li Sûrî da paşxistin û hişt dawiya
dîmenê.

Heger em li pelên her pênc salêñ
kirîza Sûrî vegeerin û bi mijîyê
nirxandinê bixwînin em ê bibînin
ku Emerika tenê xwediya bîryara
dawî ye di pirsa Sûrî de û aliyêñ
mayî tev de lîstikvan in di şanoyê
de her yek ji wan rolek jê re hati-
ye danîn, hin dewletan xwestin
roleke sereke bilîzin di kirîza Sûrî
de û rê li ber pirojeya Emerika
bigrin wek Tirkî, İran, Erebistanâ
Si'ûdi û Qeter lê hemû hewldanêñ
van dewletan têkçûn berovajî wê
ew bi kiryarêñ xwe bêtir xizmeta
piroja Emerîkî kirin.

Emerika karîbû ji destpêkê de
rîjîma Sûrî birûxîne lê dizanibû
ku berdêliya vê rîjîmê rîjîmeke
Islamî sunî ye wê wek rîjîma
İranê be û ketina rîjîmê bi vi

awayî xizmeta proja wê nake
ango nabe rêm bikeve û nabe
rikberiya islâmî biserkeve ,di he-
man demê de divê şer û pevçûn di
navbera herdiwan de berdewam
be heyâ qonaxeke din
Lewre destêwerdana Rûsyâ di
dema dawî de bi rêdan ji Emerîka
bû ne tenê ji bo ku nehêlê rêm
bikeve lê belê ji bo alozîkirina
çekdarên rikberiyê yêñ xwedan
îdyolocyâ islâmî selefi ne ,ku rola
wan di listikê de ber bi dawî ve
diçe û divê cihê wan di paşeroja
Sûriyê de tune be û divê kar bibe
ji bo jinavbirina wan ne tenê ji
Sûrî lê belê ji tevahiya herêmê
Listikvanek din daket herêmê û
roleke wî mezin heye di xizmeta
proja Emerîkî de ew ji rêxistina
Daiş bû ya ku di bin çavdêriya
Emerîka de mezin bû tev ku
Emerîka karîbû vê rêxistinê di
dergûşê de biperçiqne , Daiş
sinor di navbera Iraq û Sûrî de
şikand, jîngeheke geş ji bo hemû
(cîhadiyan)peyda ki , vê yekê hişt
ku bi hezaran cîhadiyên xwedan
ramanên kufirandinê ji hemû

cîhanê berê xwe bidin Sûr , ev ji
di bin çavdêriya Emerîka de dibû,
Daiş alaveke ji bo jinavbirina idy-
olocyâ selefi li bal gelên herêmê
herwiha behaneyekê ji bo ji nû ve
xêzkirina nexşeya herêmê.
Ji ali siyasi ve ji dîmen zelal dibe,
li ser zemîna Sûrî sê hêzên sereke
li meydanê diyar bûne -rêjîm:
(nûnerê Erebê Elewî û Şiaa)
- rikberî ku iro îtilaf nûneretiya
wê dike (nûnerê Erebê Sun-
na) - rêvebiriya xweser:(nûnerê
kurdan) ku her hêzek nûneretiya
beşekî ji gelê Sûrî dike tev ku her
yek ji wan ta vê kêlikê vî tiştî
eskere nabêje û di hundirê xwe
de hinek ji pêkhateyên din civ-
andine wek dikorekî pê riwê xwe
dixemîlinin lê ev pêkhatî di hun-
dirê van hêzan de ne li ber tiştî
ne û ne cihê biryare ne.
Piştî ku bawerî di nav pêkhateyan
de nemaye êdî nûneretiya bi vî
awayî zeminê amade dike ji bo
avakirina sistemeke nû ji dewl-
etê ...piştî hewqas hevkuştin û
hedijayeti çareserî tenê ewe ku
her pêkhateyek cuda bibe di bin



Helim Yüsiv



Şeva yekem ji gihîştina min a Amûdê û razana min a li wê mala ku min dê û bavê xwe lê sax hîştibûn û min pişa xwe dabûyê, şeveke nîvxeyâlî bû. Çavekî min li oda ku diya min lê radiza bû, çavê din jî li benda hatina bavê min bû. Heta derengî şevê jî min hêviya xwe ji hatina bavê xwe qut nekiribû. Dibe ku nikaribûn bihatina, ji ber vê ew hatin xewna min. Ji berê de ye, her ku ji xew radibim ez xewnên xwe ji bîr dikim, lê vê carê min ji bîr nekir. Ez vege riya bûm zarokekî biçûk û ew dê û ew bav li der û dora min diçûn û dihatin. Çima wiha bû, ci digotin? Min nizanibû, tenê min yek tişt dizanibû ew jî ev bû, ku her du sax in û li cem min in û ez jî li cem wan im. Serê sibehê rastiya mirinê bi xwe re anî û min

xwe tenê dît. Sêwiyekî xerîb, bê dê û bê bav, rîwiyekî dilşikestî û melûl.

Piştî xwarina taştê min berê xwe da navenda bajêr û ji wir ber bi goristana Amûdê ve, ber bi Girê Şermola yê wêranbûyi ve bi rê ketim. Dema mirov ji Qamişlo tê Amûdê, piştî nivîsa "Amûdê bixêrhatina we dike" yekem mal mala me ye. Berî pazdeh salan ji cem mala me heta "Motorê kehreba" ku dibû destpêka bajêr, çend malên jihevbelavbûyi hebûn, lê her du aliyên rê ji cem mala me hetanî destpêka bajêr hemû hatibûn avakirin û mala me bi bajar re bûbû yek. Wekî din ji berî çûna min dest bi çandina daran li ser her du aliyên rê kiribûn. Dema dar biçûçik bûn hemû biziman dixwarin û haris an pasvanê

daran "Ebû Selfîç" nikaribû wan ji êrişen bizinê birçî biparêze. Lê tev wilo ji çend dar ji bizinê şûm filitibûn û mezin bûbûn. Vê yekê kêfa min anî. Birayê min û xwişka min bi min re hatin ser mezel. Gora dê û bavê min pêş min kirin. Heta wê kêlikê ji min rê nedabû pîzotên bêrîkirinê yên ku di bin ariyê hêrs û xezeba dilê min de vêketibûn ku serî hildin û agir bi erd û ezmanê Amûdê bixin. Min derî li ber lehiya hê-siran venekiribû, ev hêsîrên germ ku bi salan e di bin sipîka her du çavên min ên li xeribiyê kor-bûyi de dişewitandin. Firehbûna û mezinbûna goristanê bala min kişand. Li der û dora gorên dê û bavê min gelek navênu ku min ew nasdikirin hebûn. Hestin wiha bi min re çêbûn ku dê û bavê min

min dibînin û ji bo ez karibim bi
wan re baxivim, divê ez û ew tenê
bin. Min ji birayê xwe û xwişka
xwe xwest ku herin û min tenê
bihêlin. Ew çûn û ez û dê û bavê
xwe tenê man. Ez yê mirî û mirî
tenê man. Ji nişke ve û devê vol-
kana ji agir ya ku di rih de razayı
bû, vebû. Ne giriyê pazdeh sa-
lan yê pazdeh hezar salî bû, ne
poşmanî û eş bû, pişo û bermayı-
yên şewateke mezin ya temenekî
pûçbûyî bû. Bi dengekî bilind
min lêborîna xwe ji dê û bavê
xwest. Ez, kurê bêwefa û nan-
kor, ku dê û bavê xwe ji mirinê re
hiştin û da pey xewnêن xwe yên
biçük û çû. Ez, gunehkarê ku
pêlén deryayêن hêşiran nikarîbûn
gunehêن wî yên giran bison. Min
pala xwe da pazdeh hezar sal ji
êşê, ji koraniyê, ji temenê wêran-
bûyî, ji sêwîti û xerîbiyê, ji toza
lal û ji ariyê. Her kes ji vî welati
ii ho ku hastir huu direviva, bi se-

dan, bi hezaran ji vî welatî ji bo
jiyanê axa xwe diterikandin, min
ji berê xwe dabû vî welatî, ne ji
bo jiyanê, lê ji bo mirinê. Welatê
ku derfeta jiyanekê baş li ser axa
xwe nedabû min, kêfxweş bûm
ku wê derfeta mirina li ser vê axê
bide. Gelo çend sal ji evênu ku di-
revin re divê, da ku zanibin ewê
ne li jiyanê, ne li rûmetê, ne li
azadiyê, lê li rewrewkan rast bê.
Jiyan û mirin, hêvi û şikestin, du-
ayên diya min, limêja wê, tizbiya
wê ya selewatan û sed karênu
bavê min bi hev re dikirin, xatirx-
westina dijwar, ciwanî û kalbûn.
Her tişt di serê min de tevlihev
dibûn û dibûn barênu gunehan,
dibûn ciyayên gunehkariyê.
Di navbera kêla ber serê diya min
û kêla ber serê bavê min de bi-
rayê min darek çandibû. Ew dan

dê û bavê xwe, ve daleqandin û hêdî hêdî li xwe, li xwezaya xwe vedigeriyam. Mîna ku pazdeh salan mirovek di sendoqeke girtî û ji zêr de be û ji nişke ve xwe li derveyî wê sindoqê û di nav axa mala xwe de xwe tazî bibîne. Wisa li min hatibû. Ez vegeriya-bûm rastiya xwe. Her tişt rehet û xwezayî xuya dikir. Piştî pazdeh salan ew cara yekê bû ku kêfa min ji min re dihat û wekî kesekî ku xwe ji nû ve nas bike li min hatibû. Hestine xweş bûn. Welat xweş e. Ev ne tenê du peyvîn erzan in ku dikarin li ser zimanê her kesî bin. Ev hesteke wisa ye, tenê mirovên ku xurbetê kezeba wan hilweşandiye dikarin bê ew ci ye. Di wê navberê re, dareke kesk û biçûçik û xweşik, mîna wê dara li ber serê dê û bavê min, di hundirê min de şin hat.

Amûdê bela tu ji nû ve bişewitî.

Gotarêñ Weşandî Nerînêñ Xwediye Xwe Ne

GOTINA ROJA ŞANOGERERIYA CİHANÊ YA SALA 2016

Her sal roja 27 Adarê, şanogerên cihanê bi roja şanoyegerya cihanê şadibin û li hev pîroz dikin, şanogerên xwe yên kevin bi bîr tînin û nameyên pîrozbahîyê ji hevre dişmin da ku ji nûve hêz bidin xwe û dest bi afirandin bikin, hin jî şanoyekê amade dikin ku di vê rojê de bilizin û pîroz-bahya heri xweş jî ew e.

Timî ji alyê ((Navenda şanogerya cihanê)) ya ku Yonisko ew çêkireye, şanogerek tê hilbijartin da ku gotina vê rojê binvise û ew gotin bi gelek zimanê dinyayê tê xwendin û di eyñ seatê de tê weşan û li ser gelek textên şano yên dinyayê tê xwendin. Ew kesê ku tê hilbijartin ji bo vî karî, yek ji şanogeran e, an nivîkarê şano ye, an ji listikvan e, an ji derhêner e û an ji rexnevan e, lê divê berhemên wî yên di warê şano de hebin û bargiranya şano kirbe û xwedî tecrûbe be.

Roja 27 ê Adavrê, çima ev roj?

Gelek kes dipirsin, çima ev roj hatiye hilbijartin, bi rastî ev roj ji sala 1961 an de tê pîroz kîrin tevî ku tiştekî nû ye jî lê disa ji li ba şanogeran tiştekî pîroz e, lê sedema hilbijartina vê rojê çiye?

Di sala 1941 an de, Yonisko ya ko weke perçak ji yekîtiya Newtewan tê naskîrin, xwest ku sazikê ji bo şano ava bike, û şanoger dan serhev da ku kareki bi vî rengî bikn, lê wê civînê ti encam nedâ û hinekî dirêj kir di nava dan û stendinê de heyâ ko sala 1948 an konferanseki serkefti li Pragê li darxistin û ew saziya ku dixwestin, avakirin, û cihê wî ji li Paris e.

Piştre û di sala 1961 ê de, disa şanogerên vê sazyê li hev civîyan û xwestin ku rojekî bi nav bikin û roja 27 meha Adarê hilbijartin ji ber ku ev roj roja vekirina Teatra Sara Bernard (Listikvana Ferensî ya bi nav û deng) bû. Û ji wê salê de heyâ iro ev roj tê pîroz kîrin û gotina salê tê nîvisandin.

Her sal di 27 Adarê de sazi-

ya şano ya girêdayî NY şanogerekî bi nîvîsına gotina salê erkdar dike.

Îsal jî vê saziyê ev erd dabû Şanogerê Rûsi Anatoli Fasiliyêv.

Fasiliyê wiha nîvisandiye: (Pirs ev e)

Ev e pîrsa ku hezarê xebat-karên şanoyê ji xwe kirin heya ku jê aciz bûn, her wiha heman pîrs e ya ku bi melyonan kesen normal jî rojane carekê ji xwe dikin? (Çi pîwest e bo me)

Di ewqase sal de li hemberî tehlaya rastiya qadêñ dewletan û kolanen Gund, bajaran ku bûyerên rasti lê diqewimin dîmen bê qîmet dibin?

Balkonên zêrîn, Hêwanen xweşik li salonen şano, Kurşîyen ji (qedife) mexmel, basken qirêgirti û dengen nazik ên listikvanan an ji di koxikên reş de ku bi heri û xwînê boyaxkirine û bi bedenê rût û tazî tijî ne, ma wê dîmen li hemberî van ci karibe ji mere bibêje gelo?

Bi rasti, her tişti!

Şano dikare her tişti ji mere bibêje, xwedawendêni li Asimaninan çawane û Girtiyen di şikeftîn binê erdê de çawa tune dibin?

Çawa hest dikarin me bifirîm û çawa evînek dikare me birûxîne?

Çawa mirov dikare jiyanaya xwe bê hebûna qencekî dewam bike?

Çawa bêhêvîti dikare desthilatdariyê bike?

Çawa hinek mirov dikarin di ferehiyê de bijî û hinek ji di kampen penaberiyê de bê hal in?

Ü çawa em rojane ji xwediyen xwe diqetin?

Şano dikare van hemû tiştan ji merre bibêje, şano timê hebû û wê her dem hebe jî!

Niha û heger mirov li heftê salen dawî binere pişti ku hemû rengên hunerê pêşketin, wê bibîne ku tenê şanoye ya ku dev bi dev, çav bi çav, dest bi dest û beden li hemberî bedenê nameya xwe radighîne.

Şano hewcedariya wê bi



Kawa Şêxê

navbînariyê tuneye, berovajî wê, ya heri zelal û bi ronahî ew e alî jêre tune ew geyanê ronahîye ye ya ku li hemû aliyan dunyayê belav dibe û her kes zû bi zû wê nasdike, jê hez bike an ji na!

Em hewceyi cudakariya şano ne, şanoya hemû ren-gan, tevî ku li gora nerîna min tevî hemû şeklén nû ji şano re şeklê heri kevin yê heri tê hezkirin e.

Şewezyen şanogerîya ayende ne mecbûr e ku têkeve berberryê bi pêşketinê nû re.

Çanda şarestanîyê roj be roj aloz dibe û hîmîn bingehîn ji çanda mirovantiyê re dihêle.

Ez niha dibînim ku şano deryen xwe li pişte û bi pere ji mîvanan re vedike, serê xwe ji nava kompûter û alavên elektronik derxînîn û berê xwe bidin şano di rîzen pêşî de rûnên û guhdañi bikin!

Li zindibûna dîmenan temaşe bikin, ev e şano.

Şano piştuğuh nekin û besdariyê têde derbasnekin; dibe ku ew tişte heri bi nirx be yên jiyan şensê wê dide me!

Hewcedariya me bi hemû rengên şano heye, tenê sehneyek heye mirov ne hewceyi wê ye, ew ji sehneya listikên siyasi ye, sehneya xebatê wan ên bê kîr e, her wiha hewcedariya me bi sehneya terora rojane ji nîne ku di nava jiyanaya kes û miletan de rûdide.

Em qet ne hewceyi sehneyen xwînê û terman e, ên ku di nava ol û miletan rijane derdikevin pêş.

Wergê: Kawa Şêxê
28.02.2016

Newroz.. Roja Azadiya Gelan e

Gelê Kurd cejna Newrozê bi eşkeke mezin pîroz dike, bi taybet gava ku wateya Newrozê xweş bizanibe, wê demê girêdana mezin bi Newroza xwe dide çêkirin. Ji ber Newroz bi xwe tê wê wateyê roja nû. ji ber berî Newrozê, bindestiyek mezin hebû di bin deshilatdariya împiratoriya Aşuri ya xwînmij ya ku gelek mîlet û gelek welat xistibû bin destê xwe û di her êrisê xwe de li ser gelan komkuji, talan, wêran û şewitandin dida meşandin û yek nimûne bajarê Babil e. Lê ew bajar wê demê bi temamî xerakirin û ev tenê yên nimûne ye ji pir nimûne wek wê. Lê bav û dayikên Kurdan bi Mîdiya dihatin naskîrin bi rîberiya Keyexsar (Kawayê Hesinkar) rîexistinek mezin pêş xist bi rîka idyolojiya Zerdeşî. Ev idyoloji ticarî bindestiyek qebûl nake, irada azad bingeh digire.

Wê demê Keyexsar konfederasyona êlîn Mîdi da avakirin û hevpeymanî bi gelek mîletan re da avakirin wek gelê Babilî û gelê ilâmî û Ekadi û gelek mîleten din ji hebû. Dîrokê ev îsbat kiriye. Artêşek mezin pêşxistin û şoreşa xwe ya azadiyê bi rîberiya Key Exsar mezin kîrin, ta êrisêk mezin birin ser merkeza deshilatdariyê di Neynewa de, bajarê ku bi elsê xwe cihê xwedawende dayîk bû, bi navê Star dihat naskîrin. Gava Neynewa kete destê Mîdiya de ji warê zilmê derket û çanda Zerdeşîya pêş ket. Welatê Mîdiya û erdê gelê din ji vegeriya ji bo xwediyen xwe. Key Exsar îsrar kî ku ciheki zilmê nehèle û deshilatdariya împiratoriya Aşuri nemîne wê demê, her der dibe cihê edaletê û wekheviyê.

Bi wê helkefta dîrokî ya ku bav dayikên Kurda yên Mîdi kîrin, vejînek mezin çêkirin. Şoreşek biwate û mezin pêş xistin û ji wê demê û şûn de dîrokê nû hat nîvîsandin. Ji bo vê ji dema nû re gotin "Niroj, Niroz" bi wateya roja nû, roja azadiyê û rûmetê. Zilm û dagirkirî ji holê rabûn, man dibe lê birîna ziman derman û rehet nabe, eger jîn û mîr bi hev re bi "ittifaq" bin û li hev bikin, rewşa abûrî nabe kelem, lêbûrîn hebe wê geleki qenc be, merov dused salî li jiyanê namîne, ji bo berdانا zêde bûye divê em li zengilê metîrsiyê xînîn û nemîrkîn pelişandina kuflétan e, herweha hoz û êl orta wan ne xweş diba, hezkirin namîne, vajî wilô kîn û dijminatî dik-eve şûna wan de, hemû bêtar çareser dibin ku mirov bixwaze, poşmanî bi dû de ye û jiyanaya xweş bê qal û qîl rîz û wekhevi xweş e, guhdañi



Besam Xelo

di pêşengatiya Key Exsar de konfederasyona êlîn Mîdi hebû û hevpeymanîk mezin hatibû çêkirin, bi gelên din re.

Em dinîn iroj ev nimûne tê ditin li Rojavayê Kurdistan ku çawa pêkhateyên din wek Suryan, Ereb, Aşûri û her wiha çawa tevlibûn çê dibe ji ber dibînin çiqas zilmek mezin heye û çawa xelasî di vê idyolojiyê de û serkeftine di alî kiryarî de xweş dibînin. Ku çawa gelê Aşûri ji zilm jî sistema împiratoriya Aşûri diditîn û bi serkeftine gelê Mîdi ew ji azad bûn. Iro ji gelê Ereb û Xristiyan bi giştî û gelê İranê û Turkiyê ji di zilmek mezin de dijîn û rastiya xelasîyê bi vê idyolojiyê dibînin. Vaye xuyaye ku li Rojava Rêveberiya Xweser çebûye û pêkhateyên din ji cihê xwe tê de digirin û hate naskîrin ku çiqas hovîtiya Daiş mezin e. çiqas berxwedaniyeke bê hempa ji aliye "YPJ" û "YPG" ve tê kirim.

Iro ji wek dema Kawa qurbanîyên giran tên dayîn ji keç û xorîn ciwan û iro tevahîya cihanê û berxwedaniyê dişopîne. Newroza hemdemî di nava civaka Kurd de tê pîrozkirin û her der bi rengên netewî tê xemilandin.

Îro rastiyek heye ku hîna gelek xebat û tekoşin li pêş civaka Kurd heye ji ber ku ji gelek aliyan ve êris hene. Hîn Mûsil û Reqa di destê çeteyen Daiş de ne û gelek deveren din ji. Lî gelê Kurd iro pir bi rîexistinkiriye û bi idyolojiya rîber Apo ve hatiye girêdan û bi îsrarek mezin tekoşina xwe ber bi azadiyê ve didomîne.



Zibêr Zênal

û guhdañi û şiret xuya jiyanaya jîn û mîr e, bera cam neşîkê, ji ber nema wek berê vedi-gere, û tim merov berî ci gave bavêje, zaroka bîne bîra xwe.

Serîhildan Berdana Jinê

Berdana jînê di van demen dawî pir bûye.. çima? Di şoreşan de gelek tişte çewt û tewşê dîbin mirov bêhînteng û engîri dibe.

Li malê, li kolana, li dibistana û li bazara, divê merov bêhn fireh be. Bêkari pir dibe û bi-habûna alava û mîrkîrin kêmî dibe, jîn ji hêla rîexistinê mîna (Yekîtiya Star) û (Mala Jinê) nav tê dan û ji wan re tê gotin hûn azad in, wekhevi çebûye, eger hevjinê te pevkê bêje ji te re didwa lê vegerin. Xuşkê me li dibistanan mamoste ne, por birîne, dirûtnê dikin, asayıs in, leşker in. Rêz û hur-

meta min ji wan re heye, ew nîvê civakê ne. jiyan xweş e bi şewirdarî, ew jî ji ber gelek sedemîn curbecur, ci di warê aborî, civakî, û siyasi de. divê ku tu bikşînî ew sist bike, ew bişidîne tu sist bikî, xweş e merov bi danûstandinê bi guftûgo rojên xwe yên nexweş biqedîne ji bo jiyan berdewam bibe. Ger rîz nemîne li nav kuflétan û adet-perest û rewîst bê hilanîn wê pelişandin li civakê çebîbe, û gelek astengî û kelem bikevin riya berdewamiya vê jiyanaya xweş, jînA kurdi li cihanê bû destan û efsane, nav û dengê

wê li hemû cihanê belav bû û deng veda, bû mînaka lehengî û wêrekîyê, yekî wek (Welid Can Pûlat)û (Semîr C'ec'e) û (Salih El Qelab) gotin jîna kurdî lehenge, wek sed zilamî ye, pêşmerge ye. Dema rîz û guhdañi li ramana nemîne wê veihatîn çebîbe, pişti nelîhevîkîrinê û berdânê, wê zarokên delal ku merov jiyanaya xwe jîb o wan dike û bi şev û roj li kolan û çolan baz didin bê ban û serkan bimîn û kuflét wê bipelişî û ji hev bikeve, em jîbir nekin çaksazî û şiret û hinek kesê çalakvan hene nahêlin ev rewş û hal

bîghî a dawî, û ku bêzave li cem Xwedê. Tim merov dûrî berguneha be û divê Qelen a sta û dawî kêm bibe, û ya baş ew e ku nemîne, bera xelata wê gustilkek be, û eger rewş tenik be, bera ji zîv be, û eger tune be, bera weke Muhammed Pêximber gotiy gustilkek ji hesin be, bera girêk ji ber mîrkîrmê werin hilanîn, û rî li pêşiyê vekirî û bekelem bimîne. Rijandina pera bê sûd li tiştin vala mîna stodiyo û nadî û govend tiştin ne gelekî pêwest in eger rewş merov ya abûrî tenik be... dûbare tînim ziman birîna çekan der-

Mihemed Elî Hiso 1931-2016



"Helbestvan
Mihemed Elî Hiso
di sala 1930î de li
gundê Moza yê girêdayî
bajarê Amûdê li Roja-
vayê Kurdistanê jidayik
bûye... Ji ber ku tenê ew
kurê malbatê bû (we-
hîd bû) malbatê ew di
temenê 13 salî de
zewicand".

Bûkê

Bûkê rindê ciwanê, kevoka
Kurdistanê
Gava çavê lê ket, dilê min agir
vêket
Min go qey rok bû derket,
tava xwe da cihanê
Bûkê rindê ciwanê, kevoka
Kurdistanê
Bûkê rindê ciwanê, kevoka
Kurdistanê
Rabin zûka me b'rêkin, xemla
bûka me çêkin
Ava gulan pir lêkin, bejin tayê
rîhanê
Bûkê rindê ciwanê, kevoka
Kurdistanê
Bûkê rindê ciwanê, kevoka
Kurdistanê
Zava xorke Kurde, jîr û şepal
û rinde
Şérîn û pir lewende, can daye
Kurdistanê
Bûkê rindê ciwanê, kevoka
Kurdistanê
Bûkê rindê ciwanê, kevoka
Kurdistanê
Bûka me xwendevane, serbil-
ind û ciwane
Çavên me li rî mane, xort da-
ketin meydaê
Bûkê rindê ciwanê, kevoka
Kurdistanê
Bûkê rindê ciwanê, kevoka
Kurdistanê
Va bûka me rabû, dilê berbi-
wan şabû
Kul di dil de ne mabû, tevde
rabin dîlanê
Bûkê rindê ciwanê, kevoka
Kurdistanê
Bûkê rindê ciwanê, kevoka
Kurdistanê
Qamişlo 1962

Sorgul

Hey sorgul
Dilbera bilbil
Jîna dil
Tu yî bawerî
Tu yî hêvi
Tim hinera min
Çima geş nabî..?
Çima na pişkivî..?
Em te av didin
Bi xwîna xortan
Bi xwîna keçan
Ma ava Dicle û Ferat û
Xabûrê malmîrat
Tu nabê ji ku hat !?
Xwîna şehîdan e
Cobarê jinbiyan e
Rondikên sêwîyan e
Hey sorgul
Bilbil li ser te dinâlin
dikalîn
Bûne Cegerxwîn
Rengê Goran û Bêkes
Bûne xemgîn

Dil û can
Ji bo te dan
Kirme qurban
Qadî, Seid, Bêrîvan
Tu avdan
Emê te av bidin bi xwînê
Ji lêvîn birînê
Ji kaniya lêv sor
Tê bijî
Tê vejî
Bi azadî
Bi dilşadî
Sorgul
Dil geş dibe bi dîna te
Serxwêş dibe bi bîhna te
Dinê dide mîzgîna te.
Qamişlo 1977

Di 20 saliya xwe de bi
birrek ji helbestvan û
siyasetmedar mîna Osman
Sebrî, D. Nûriddîn
Zaza, Cegerxwîn, Cemal
Nebez, li çayxaneya
Havana li Şamê civiya,
û li wê deverê yekemin
helbesta xwe li ser bajarê
Borse'îd ê Misirî got, û bi
dilê gişan bû.

Navê KURDISTAN

Hatiye nîvîsandin li gulin-
yên porzerê
Li ser lêvîn şehîdan li kevi-
ya cegerê
Li kenarê birînê li ser
qevda xencerê
Li xwîna xort û keçan li kozik
û çeperê
Li rabûna bindestan li devê
mawî zerê
Li zendîn fidakaran li ser
baskên qenberê
Li ser tîrêjîn rokê ko
davêjin pencerê
Weke reha firêzê bela
bûye l'her derê
Li ser lat û zinaran hêrza
dide hunerê
Li ser dil şax vedaye wek
evîna dilberê
Ketye binê deriya wek
gemî û lengerê
Di paxila Xwedê de mîl
daye ser kemberê
Kî dikare bidize!?
Yan
derîne j'wê derê?
Xwedê Kurdistan çêkir
şaş maye li himberê
Eger Tofan jî rabe disan
wek carê berê
Wê Kurdistan kat bide
ji nav kul û kederê
Divê neyar bireve zû ji
Kurdistan derê.
Qamişlo 1970

Şivano
Lo şivano, lo şivano
Biçûko pir ciwano
Pez ketiye ser çiyano
Tîrsa min ji dizano
Şivanê min dengbêje
Ger du peyvan dibêje
Ew canê min dipêje
Dil dibe bi talano
Dema dengê wî nayê
Li min negre lê dayê
Ji tîrsa ketme tayê
Lo hogîço berano

Şivanê m tembûrvane
Pêçiyêñ wî ji ba ne
Bi a dilê min zane
Li min bûye mîvano
Dema dest davê têla
Evîn min dide pêla
Dilê min dike mîla
Her bijî dilêvano
Qamişlo 1963

"Helbesta "Nalîn"
resentirîn helbesten
wî ye, ku li ser keça xwe
"Nalîn" ya ku di riya
azadiya rizgarkirina
Kurdistan de
şehîd ketiye
nîvîsandîye".

Şîna Mihemed Şêxo

Di kali û di nalî
ji bo vî miletê jar
Ji bo bindest û jaran
qîrînû hawar
Kezeb tevde dibû xwîn
perce perce dihat xwar
Rê tevde li ber girtin
digere war bi war
Xwestin ser bitewîmin
daxînin ji kenar
Xwestin pêçîyan jêkin
bimîne pûc û sar
Yan jî wî bêdeng bikin
lal bimîne wek diwar
Dixwestin wî kin bikin
çar buhustan bi jîmar
Lê ku hat û desîsî
ind dibû wek çînar
Wî serê xwe ne tewand
digot zinhare zinhar
Li ber Walî radibû
rengê çayê Gabar
Wek Bertewîlê Darê
wek lat û zinar
Bavê Felek namire
ser bilin be her car
1989

Şehîd Dr: Azad

Ev piling qet ne westî
Ji bo jîna serbestî
Mirin xweş e bi rastî
Ji vê jîna bindestî
Bimre bimre bindestî
Bijî bijî serbestî
Li Romanya ê zana
Serokê qomîtana
Serdarê jîr û zana
Rabe kîr giha hestî
Bimre bimre bindestî
Bijî bijî serbestî
Ji bo van cî û wara
Ji bo van dost û yara
Tu çû şerê kedxwara
Bimre kevneoresti
Bimre bimre bindestî
Bijî bijî serbestî
Ji bo xwînmij bimire
Kê şûna te bigire
Soza me bi soza te re
Em kar nekin bi sistî
Bimre bimre bindestî
Bijî bijî serbestî
Dijminê me xerabe
Ji xwîna me têr nabe
Divê dîsa tu rabe
Şerê vî polperesti
Bimre bimre bindestî
Bijî bijî serbestî
Va serok dibnêje

Şerê me dûvdırêje
Dijminê me qirêje
Tev rabin vî faşistî
Bimre bimre bindestî
Bijî bijî serbestî
Qamişlo 15.12.2004

Şivano

Lo şivano, lo şivano
Biçûko pir ciwano
Pez ketiye ser çiyano
Tîrsa min ji dizano
Şivanê min dengbêje
Ger du peyvan dibêje
Ew canê min dipêje
Dil dibe bi talano
Dema dengê wî nayê
Li min negre lê dayê
Ji tîrsa ketme tayê
Lo hogîço berano
Qamişlo 1963

Rakeve

Miletê Kurd rabe dereng e
Te ne nav û ne deng e ...
Rabe deriyê tarîxê
Deriyê jînê bikut
Bi destekî xurt
Nemir... nemir ... venemir ...
venemir
Rabe miletê jar
Tu ji vê jînê mayî bê par
Tu mayî sar
Gêj û xwar
Çîma nabi şîyar!?

dimeşin

Em bi te re roj û şev
Em bi te re dil û dev
Ji dijmin re kîn û gef
...

Apo

Agirê şoreşê te dada
Li deş û çiya
Kurdistan
Bûye volqan
Bûye burkan
Bûye agir
Bûye xummîn

Bil-

Dijmin û neyar
Te dixapînîn
Şêx û mela te dîlorînîn
Axa te ji hev dîxînîn
Li ser te dîxwînîn

wî

Rakeve miletê Kurd.. rakeve.
Eve jîn
Eve zanîn
Eve dîn
Rakeve.. rakeve
Her bi jêr de dakeve
Qamişlo 1963

.....

Rakeve miletê Kurd.. rakeve.
Eve jîn
Eve zanîn
Eve dîn
Rakeve.. rakeve
Her bi jêr de dakeve
Qamişlo 1963

"Ji dîwanêñ wî Zîlan
2004. Derdê Ezîtiyê
2002. Berxwedan 2012
ew jî diyarî giyanê
şehîdîn Partiya Karkerenê Kurdistanê "PKK"
kiriye .
Di roja ìnê 4/3/2016an
de û pişti berxwedaneke
dirêj bi nexweşiyê re li
bajarê Qamişlo koça
dawî kir, û li goristana
Hilîliyê hate veşartîn".

Apo

Apo
Lênen.. Hoşîmîn
Derdê me zanîn
Apo birûska şeva tarî
Te şewq daye vî warî
Xwediye barê giran
Ararat ê Kurdistan
Averêstê cihan

Hêviya bindest û jaran
Hêsîr û birîndaran
Qilçixê çavê
neyaran
Apo
Xwediye gavê
mezin
Xwediye dilê
mezin
Em bi te re
mîr û jîn
Mîna lehî

dimeşin
Em bi te re roj û şev
Em bi te re dil û dev
Ji dijmin re kîn û gef
...
Apo
Agirê şoreşê te dada
Li deş û çiya
Kurdistan
Bûye volqan
Bûye burkan
Bûye agir
Bûye xummîn
Bûye gurmîn
Kurmîn darê
Tevlî qirêj û gemarê
Diweşîn têx xwarê
Kurtêl-xwer û sehêñ har
Guh miç kirine
Çav pêl kirine
Li ber tenûra neyar
Ditîrsin, direyin
Çar kenar
Apo
Agirê şoreşê namire
Venamire.. venamire
Ta ku hebe insan
Ta ku hebe zemîn û zeman
Ta ku hebe Kurdistan
Apo
Rêberê mezin
Agirê şoreşê geş bû
Berf heliya
Li çol û çiya
Li dizan bûye sîbe
Direvin... radibin
Dikevin
Li hev vedigerin
Dîsa dicivin
Qure-qure wan
Wek gola beqan
Bêhêz û erzan
Pir sar bûne
Pir nerm bûne
Bûne herî
Bûne hevîr
Ne bawerî, ne bîr
Xwe difroşin
Xwe didoşin
Axê li serê xwe dikin
Dor bi dor
Mîna xiltê kor

Dijmin û wan
dajo wek pezê col
Wan dike sê qol
Wan dike heft qol
Wan dike pazde qol
Wê bike cil qol
Lê mîna hebana ben filiti
Mîna heçiyê şikestî
Bêkîr in..
Bêxîr in...
Ji meydanê direvin
Dikevin karê dijmin
Qamişlo 1988

Kurmê darê

Hey kurmê darê
Zû dakev xwarê
Wer ber piyêñ min
Bimre yek carê
Bimre, biperçiq
Wek serê marê
Geh kerr û lal e
Li vê bazarê
Geh jî direye
Li vê navtarê
Dighe neyaran
Şev û reştarê
Tevde sazdikin
Mirina darê
Qamişlo 1995

Xêrhatîn

Kerem kin xuşk û bîra
Bi xêr hatin, ser sera
Hûn hatine serdanê
Piraz bikin vê danê
Dana xwîna şehîda
Bêrîvan û Egîda
Dawxaza Apê min e
Divê xwîn ne sekine
Heta neyar derkeve
Doza me biserkeve
Qamişlo 1994



Penceşêra sîngê

Penceşêra sîngê, yek ji wan nexweşîyên giran e ku heri zêde jin raserî wê tê. Bi kurtî penceşêr, ango kanser, ew nexweşî ye ku malzaran bedenê ji kontrolê derdikevin, bê serüber zêde dibin û ziyanê didin bedenê.

Yek ji penceşêra ku heri zêde li cem jinan peyda dibe penceşêra sîngê (penceşêra memikan) ye. Penceşêra memikan ji ji kontrolderketin û zêdebûna malzaran bedenê pêk tê.

Hinek ji sedemên çêbûna penceşêra sîngê ev in:

- Bi taybet piştî 40 salibûnê peyda dibe
- Kesênu ku di malbata wan de penceşêra sîngê hebe yan berê hebû.

- Jinênu ku di temenekî dereng de zarokan tînin
- Jinênu ku tedawî û dermansazîya Ostrojenê dibînin.
- Jinênu ku heb û dermanê kontrolkirina zabûnê (zarokanînê) bikar tînin.

- Jinênu ku cixareyê bikar tînin Bi van kesan re derfeta çêbûna penceşêra sîngê zêdetir e.
- Di penceşêra sîngê de teşîhsî û pêhisina zû û lezgîn girîng e. Heke teşîhisek zû bê kirin û zû pê bê hisin, derfeta ku

penceşêra sîngê bê dermankirin û rîlibergirtin, pir e.

Ji bo teşîha penceşêra sîngê bar dikeve ser milê jinan ji. Berî herkesî divê jin möhê carekê be ji xwe bi xwe kontrol bikin. Di vê kontrol û saxfikirina xwe de, heke jin pê bihisin ku di sîng û derûdora sîngâ xwe de guhertinek çêbûye, divê nesezin û serî li doktor bidin.

Nîşan û alametên penceşêra sîngê:

- Qalîbdûn, werimîn û rengvedana çermê sîngê.
- Heke di sîngê de hiskûn û êş zêdeyi hefteyekê bajo.

- Heke serê memikan qalind (stûr) bibin, sor û kul bibin û brîndar bixuyin.


- Heke memik û derûdora memikan bêşin û ew êş zêdetir xwe bikşîne nava memikan.

- Heke di şîkl û şemalê memikan de guhertin çêbibin.

- Heke di cih û sekna serê memikan de guhertin çêbibin.

- Heke serê memikan bîzen (av, girêz yan tiştekî din jê biherikin).

Di van rewşan de divê meriv nesezin û serî li doktor bide, xwe kontrol bike û dilê xwe têxe cih.



Peyva Wendayî

Peyva wendayî ji 7 tîpan e, merivê ji malbatê.

Dayik, bay, kur, keç, mam, xal, xaltîk, metik, dotmam, pismam, bapîr, bira, xwîşk.

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	X	D	A	Y	I	K	D	M
2	A	B	K	X	M	K	O	A
3	L	I	U	A	V	E	T	M
4	T	R	R	L	A	Ç	M	R
5	Î	A	A	L	B	B	A	Î
6	K	X	W	Î	Ş	K	M	P
7	P	I	S	M	A	M	A	A
8	M	E	T	I	K	T	Î	B

Mamik

Ne dest e, lê wek hev e
 Ne şe ye, wek melêv e
 Pehn dibe bi erdê ve
 Mirov dipîve gav e!

Wek stêrkan diçirûske
 Deriyê wê wek brûsk e
 Rondik davê wek nîsk e
 Li ser dileqe birû û bisk e
 Kî ker nebe, wê naske!

Ximav û xar
 Lastik û dar
 Tili lê hewar
 Li kaxezê bar
 Tipêñ yar û har



Bersiva Mamikên hejmara (38)an:
 Serî – Tilî Û Dest - Guh

Kurdî Xwes e

ابداني	Palvedan
انکاء	tawanbarî
تهمه	şûnwar
اثار	xweparastin
اجتناب	sotin - şewat
احتراق	rêzgirtin
احترام	Werîs
حول	pêdîvi
اجات	Yedek
احتیاط	piştxûz
احدب	çakî
احسان	hinav
احشاء	serjimêri
احصاء	Pispor
اختصاص	rewîst
أخلاقی	

Xacerêz



Asoyî:

- 1-Şirovekarê helbestên Cizîri.
- 2-Nivîsgeh (vajî), welateki asyayê (vajî).
- 3-Awaza nivîskî.
- 4-Tersî stand (vajî), zaraveki Kurdi.
- 5-Ji bo ciwarê nêzîk, dewarê nêr (vajî).
- 6-Pakrewaneke Kurd, ji tilûran.
- 7-Evîndar jê hez dike.
- 8-Pisporê hendesê.

Sitûnî:

- 1-Taxeke Şamê.
- 2-Paşkîteke kirar, di dev de ne.
- 3-Viyan, müyên rû.
- 4-Alava germkirinê (vajî), heman (vajî).
- 5-Axa li ber ba, zarok jê re bû (vajî).
- 6-Şêwe û cure (vajî), bêriyê (bê dengdêr).
- 7-Wekhev, Wekhev.
- 8-Nasnavê lehengê kela Dimdimê.

